

Çi kesek zêhniyeta derûna me dixwîne

»»» R:9



Newroz peyamek bo dagîrkerên Kurdistanê bû

»»» R:4

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duhestînameyek Siyayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (419) 5-04-2022 Buha (1000) Tûmen

Îran û krîz - Valahiya di navbera xelk û berprisan de

»»» R:6

Kurtiyek li ser wesiyetnameya serkomar Pêşewa Qazî bi “kurt û kurmancî”

»»» R:8

Rêûresma 10ê Xakelêweyê roja Şehîdên Kurdistanê di binkeya sereke ya PDKÎ de bi rê ve çû

Rêûresma 10ê Xakelêweyê roja Şehîdên Kurdistanê û hev-dem vebîranîna yada 75emîn salvegera şehîdkirina “Pêşewa Qazî Mihemed” û hevalên wî li binkeya serekiya PDKÎ hate lidarxistin.

Sibêdeha roja Sêşemî 9ê Xakelêweya 1401an Rojî, rêûresmek taybet bo roja Şehîdên Kurdistanê, 10ê Xakelêweyê li goriştana şehîdên Hizbê û bi beşdariya Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî” beşek ji endamên rêberî, kadr, pêşmerge, malbatên şehîdan û mêvanan bi rê ve çû.

Rêûresm di beşa yekê de bi rêjeya leşkerî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê ber bi tirba şehîdan ve destpê kir û li ser tirba şehîdan du sirûdên bi navên “Ey Şehîdan û Merêjin Bom Firmêskî Xem” ji aliyê Hêza Pêşmerge ve hate sitrandin û piştîre Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî” û herwisa hevjîna şehîd Luqman Mêhfer, Xedîce Lahîcanî, ku keça şehîd “Mela Ebdulrehman Lahîcanî” û xwişka şehîd “Murad Lahîcanî” ye, deste



gula rêz û emegnasiyê li ser tirba şehîdan danîn.

Di beşa duyem de û piştî xwendina sirûda netewiya “Ey Reqîb” û ragirtina xûlekek bêdengî bo rêzgirtinê ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê, peyama taybet a rêberatiya PDKÎ bo 75emîn salvegera îdamkirinê û şehîdkirina “Pêşewa” û hevalên wî, ji aliyê Endama Navenda Siyasî ya PDKÎ, “Fatime Osmanî” ve hate pêşkêşkirin.

Di beşek din de, sirûdek li jêr navê “Şehîd” ji aliyê kora mûzîka Hêza Pêşmerge Kurdistanê û zarokên Navenda Nêrgiz ve hate pêşkêşkirin.

Piştîre peyama Navenda Hevkariya Partiyên Kurdistanê Îranê ji aliyê “Şemal Terxîbî” ve hate pêşkêşkirin.

Di beşek din a vê rêûresmê de, helbestek li jêr navê “Şehîd” ji aliyê “Ebdulrehman Yûsifî” ve hate pêşkêşkirin.

Piştîre peyama hevpar a Yekîtiya Jinan, Lawan û Xwendekarên Dêmkarên Kurdistanê Îranê ji aliyê Endama Heyete Birêveberiya Yekîtiya Jinên Demokrat a Kurdistanê Îranê “Jiyan Mihemedî” ve hate pêşkêşkirin.

Di dawiyê de, sirûdek din a li jêr navê “To Behêzî” ji aliyê Xulam Fatihî û bi hevkarîya kora mûzîk a Hêza Pêşmerge Kurdistanê ve hate pêşkêşkirin.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Kiryar û tevger li cîhana sehpêkirî yan berheşt de tev li cihekê de destê pê dîkin û di cihekê de bi dawî dibin. Bi vê wateyê ku her tevger û her kiryarek diçe nav çarçêveya bûyereke demkî de ku girêdayî demê ye û herwisa derbasbûna demê, ev bûyer tê guhertin yan dawî pê tê û seh bi hebûna wê li cîhanê de nayê kirin.

Lê, bo derbasbûna ji dawî zeman û demê, rêyek heye ku ev jî girêdayî bi cîhana hizir û ramanê ve yan cîhana damalîna ji demê ye.

Li cîhana ber awez yan heman peywendîdar bi hizir, hêvî û ramanên paramêtra bi navê demê bandor nîne, belkî rêkkestin û şibandina digel fektorên çarçêveya mējî û bîrkirina kesane de, dewreke bandordar heye.

Di raştîyê de şibadin dibe cihgîrbûna demê û vîrda her takek digel wêp bîrkirinê nasyar be wer digire û dubare dibe sedema jidayîkbûna hizir û ramanê.

Li civaka mirovahiye û di Kurdiştanê de jî, her takek rojane û salane hezaran kiryar û kirdaran wî/ê dibe û peywendî bi takên din re girê dide ku piraniya wan kiryan demkî ne, yanî girêdayî demê ne û bi derbasbûna demê, bandora wan bi dawî dibe û di raştîyê de bûyer dimire.

Renge di civakê de gelek caran çê bibe ku, takek bi sedemekê heta bi awayê bi zanebûn jî canê wî/ê jê bê şandin û desthilata dadwer

Bê dawî



iyê, bona sereraştîkirina hêla berdewamiya jiyanê cezayekê bo tawanbarê kujer destnîşan bike û li nav hin desthilatan de jî, heta bikuj tê bidarvekirin da ku hevsengiya mirin û jiyanê hatibe ragirtin û mirovek li hemerî canê mirovek din de bê kuştin û bi vî awayî civak seh bi aramî û rihetiyê bike ku êdî dubare her tişt li cihê xwe de ye û bi vî awayî mirina bikuj û yê hatî kuştin dibe bûyereke demkî û bi derbasbûna demê, civak wê ji bîr dike.

Lê hin mirov hene ku jiyanê wan û mirina wan bi girêdana bi demê ve derbas dîkin û ew fektora hizir û awezê tînin ber çav û bawerîya xwe.

Di raştîyê de kiryarekê encam didin ku di hizira mirovên din de weke nivîsa li ser kevîran hil dikolanînin û fektora şibandina digel bawer û hêviyan bûyereke e ji bûyereke asayî ve derbas dike û kincên dembûnê liber derdixe û li cîhana ber awezî de dibe bi bikirek hişyar.

Mirovên han ev in ku di jiyanê de pêşmerge ne û dawîya jiyanê wan dibe destpêkek din. Bi mirina wan dibine şehîdek ku êdî tev sînoren demkîbûnê derbas dîkin û hundirê biyava hermanê dibin.

Êdî li pêxema şehîd de neku kuştina kesek, belkî canstandina dehan kesên din jî, nikare hevsengiya dem û demkîbûnê li ser bûyerê de bisepîne, çimkî şehîd takek hatî kuştin nîne ku bi bûyerêkê tê de cûbe, belkî mirina şehîd, hişyarbûn û liber xwe derxiştina kincên demê û jixwekirina kincên bûn bi hêma û gihîştin bi bilindahiya bawermendiyê ye. Mirina şehîd tev fektorên dem û cîhana berheşt derbas dike û li memliketa herman de bangeşeya berdewamkirinê dike û bangeşeya rêwîngên din dike.

Her lewma şehîd namirê û li nîştimana bawer û hizirê de rêber e.



Bandorên tundûtîjiyên bi sedema şeran li ser jinan

N: Nîştiman Urmiye

W: Hesên Mukerem

Şer weke yek ji bandorên deşhilatdariya mîr û xemgîntirîn biryarên mirov di dirêjahiya dîrokê de bûye ku, rûyê wê yê neyînî di hilberandin û dubarekirina hêrs û tundiyê de bi bandor bûye û rêyên dîrûdirêj û bêencam li ser civakan sepandîye ku, bûye cihê mirina hêdî hêdî ya jîngeh û xwaziya mirovan.

Bandorên şeran hêz, kûrahî û panhiyeke berfireh e ku li ser veguhestina sînûrên mirovahiye li nav koloniya armancên xwe de, xwedî bandoreke girîng e, û bêguman bandora deşhiladariyê di serî de li serdestiya cîhana xwe digere heta ku daxwazên xwe yê hejmonîk û ferzkirî bi nermî li xwe bike û rewabûna wê ramana serdestî dirêj bike.

Di dirêjahiya dîrokê de şer bûne sedema jînavçûna şarîstaniyet, jîngeh, rêwîtiya çerxa jiyana normal, guherînkariyên demogirafiyê, koçberbûnên bizorê û ... hwd lê, berfirehiya wê dariştanê zêdetrî her tiştî jin kiriye qorbaniya tundûtîjiyên bêsînûr yê xwe û jin weke koloniyeka berfireh a şer û kavlkariyên hertimî bo serketin, bîrêzî û deşdirêjîkirinê bûye û herwisa xwarina rihet bona serketin li ser hizirên şer û zilma zayendî di demên şer û talankirinê tîne hesabkirin û çengavêtina li dijî wê pêka derdor nêşînbûna wê heta qaseke zêde hêsantr kiriye.

Û aliyên namûsî yê zal li ser bedena jinê ku wê lawaz hesab dike û xala zivirînê ya di pêvekê de di demên şer û aloziyan de bi koletiyê ve girê dide. Ango encamên şer di demek herî kin de pîrs-girêk û arîşeyên jinan ji derdore derdixe nava xwe, û ev jî rêya derketina ji kûrahiya qobiyê ye.



Ji ber ku, cudahiya zayendî berfirehtr dike û di vê valahiyê de derzên kêmtene vekirin ku, bala ramanwerên mafên mirovan ji şîdeta ku bi awayê rûtîn li dijî jinan li mal, cihên kar, li ser şeqaman û ... hwd tê bikar anîn û wê dîr dixîne û normalîze dike.

Di heyamên berê yê ne gelek dîr de, bandora şer li welatan û civakên ku qurbaniyê şerê hatinî sepandin û navxweyî û yê bedel di bin deşhilatdariya zal a sermayedariyê de bûne, nîşanderên wê mijarê ne, tevî qutkirina girêya şahregên berfirehkirin û pare ragirtina wê civakê di qirika paşverûtiyê de, tenê serê ku hatiye birîn encama wê kirîzê ye, "jin" hemen koloniya kevin û veşartîye ku, gelek kêmtir di demên wiha de tê nîqaş kirin, ji ber ku di naveroka rejîma şovenîsima zayendî de ciheke lîzok bûye nesîbê wê.

Rejîmên şer yê di welatên weke, Îraq, Efixansitan, Sûriye û ... hwd, çendîn mînakên ku di heyama salên nêzîk de bi hebûna şer, jînavbirin û tecrîda giştî ya cihê pêgeha jinê tê hesabkirin ku, di wan deman de statûya jinê hatiye kolekirin û yek ji berbelavtrîn tundûtîjiya sed-sala niha pêk hatiye. Ji ber ku encamên wê bi tevahî xerabkirina aliyên derûnî û fizîkî yê jinê bû, di demên şerê deşhilatxwazan û mîrsalaran de, bi hezaran jin bilî ji cudahîdanîna zayendî bûne qurbaniyên cudahîdanîna eşîreyî

û mesebî jî, û di bazaran de weke xolamok yan koleyên zayendî hatin firotin, ji ber ku koletiya jinê û kolekirina ruh û bedena wê ji aliyê koleyên şer ve serkeftina herî mezin ji bo talanker û dagîrkerê serkeftî tê hesabkirin, bi gotinek din li gor hizira wê ya misoger û şovenîzim, ku jinê milkê xwe dizane û deşdirêjiya li ser jinê û herwisa îstîsmara jinê di şer de geştir dibe û wisa diyar dibe ku, di rewşên wiha de rola jinê ya di şer de derbe xwarî, lîstika di nav aboriya binerdê(reş) de zêhîniyeta serkeftî ya şer e. Çawa ku firotina jinê Êzîdî bû sedema firotina bi milyonan Dolar pereyên reş ji bo aboriya binerd ya komên wekaletê, di şerên din de jî, jin bi awayên din weke amûreke madî ya biker hatine îstîsmarkirin.

Şer bi çend awayan jinê dike qurbaniya armancên xwe

1- Şeweya herî girîng û belkî herî nazik a bikaranîna bingeha mexdûrên şîdeta şer, marjînalîzekirina jinê bi xwe û veguhestina wê ji bo nîşanek ji cend pêkhatyên sererd û mîkro ye.

2- Tişteke ku şert û mercên lawaziya toleransê himbêz dike, li gorî xwaşteken ezoterîk ên tundûtîjiyê raştî çendîn corên îstîsmar kirinê dibe.

3- Tecrîd bi qasekê dibe: Ji ber ku cewherê şerê mîrsalarî û îmajê wê li ser esasê

otorîterîzmê ye, nirxdayîna statûya wê ya zayendî li ser bingeha cewsandîyê ye.

4- Di enrdingariya şer de kêmtir dikişîne li ser cihê rengî û bûyerên ku ji encamên wê yê gewriyê derdikevin, ji ber vê yekê dîroka cihêkariyan ku deşteserkirina mafên bingeheke jî jinan piştraşt dike, di bin qatên wê erdnigariyê de cih digire.

Loma erdnigariya şer, di her astê de û li her deverê li ser rûyê erdê, bi nîşandana tundûtîjiyê di kûrahiya çînên jêrîn ên civaka xwe ya biryardanê de xwe li gor daxwaziyan xwe razî dike.

Û di serê pîramîda zal li biryaran de tê tesbîtkirin, loma, eger em dixwazin di civakên şerxwaz û mîsalarî de ji çînên jêr û jêr veqetînekê bi deşt bixin, bêşik ew yek ji herî nizimtirîn çîna zayendî ye. Ku di hemen demê de çîna herî bibandor û fedakar e.

Mînaka herî nêzîk keç û jinên ciwan ên Afxaniştanê ne ku herî zêde ji polîtîkayên şer ên çeteyên sîvil û îslamîstên bingeheke bandor bûne.

Çend gavan paşve bavêjin û bibin qurbaniya yek ji biryarên herî kêmtir ên girêdayî kirîza serweriya axê. Ev mînak dikare bibe mînakek zelal ji bo mexdûrên tundûtîjiyên di civakên cuda de bi awayên cuda li welatên din de.

Newroz peyamek bo dagîrkerên Kurdistanê bû



N:Dara Natiq

Newroz cejna neteweyî a gelê Kurd e. Ji bo gelê Kurd cejna Newrozê herî rojke azad û kevin e.

Dîroka Newrozê digîhije 2722 salan. Newroz ji bo gelê Kurd hêmayê azadîxwaziyê ye û hertim weke destpêka serhildan û raperînê ye. Hertim li Kurdistanê bihar û germahiya serhildanê têkelî hevbûye. Newroz ji bo gelê me cejna vejîn, diyarbûn, vegera xwezayê û cewherê hebûna civakê ye. 2722-salan vir de ye ku gelê Kurd cejna xwe ya Newrozê di meha Adarê de pîroz dike û li serê çiyayan û li kuçe-kolanên Kurdistanê agirê Newrozê êvara 21'ê Adarê hildike û govend û ştranên netewî li ser cejna Newrozê diştrîn û govendan digerin.

Newroz li dijî zilm, zorê û xwînmijiyê nîşana serkeftinê û azadiyê ye, Newroz hêza li berxwedanê ye, ji zivîştanê destpêka biharê ye. Newroz hêviya jiyanê ye, tov, berêketa jiyanê ye. Newroz agirê azadiyê yê herî mezin û herî xurte. Ev agir bi şevq û şemala xwe, bi ronî û tîrêjên xwe bi tarî û tariştanên diqelêşe. Newroz bûka azadiyê ye. Azadî bi Newrozê şah dibe, Newroz bi azadiyê kêfxweş dibe.

Newroz diyariya Kawayê hesinkar e ji bo gelê Kurd û gelên cîhanê ye. Cara yekemîn ev agir ji aliyê Kawayê hesinkar hevrêyên wî ve hatiye pêxistin. Newroz ji bo zalim û xwînxaran mirin e.

Ji bo bindest û mazlûman dilane, şahî ye, xweşî ye, firehî ye, devlemendî ye, serbestî ye û azadiye. Newroz di riya serxwebûn



û azadiyê de tekoşîn û li hemerî zîndanan ronahiye, li çiyayan, li deştan, li gund û bajaran serhildan e. Ceqna Newrozê şahî, xweşî, seyran e ala wekhevî û biratiyê ye.

Ev agirê Newrozê nabe bê tefandin, ji ber ku ev di hişê gelê kurd de ye, di mejiyê me de ye, di bîra me de ye, di baweriya me de ye û di dilê me de ye. Ev agir nayê tefandin. Newroz bo Kurda cejna netewî, sedema serkeftin, jiyan û azadiyê ye. Newroz bo me salekî ku her wext hêvî, hêz, moralê dide û destpêkekî nû ye.

Ji ber wê em li rabirdûiya xwe binêrin, ji xetayên xwe yên borî desr hîn bikin û xweşbîn bin.

Em tev bi hêvî û bi rohnî li paşeroja xwe binêrin. Em tev hêzên xwe bikin yek û bi hev re bixebitin, dest bi dest, mil bi mil bixebitin da zehmetiyan vêde bibin.

Em hêmayên Newrozê, bi rêniwîniya berxwedan û mokim bûn li ser xebatê heya bideştve anîna armancên bilind yên rizgariya neteweyî dizanin û li ser wê baweriyê ne ku zilm û serkêşî û tarîfî û fetisandina dîktatoran li berevaniya dawî û li hember ronahî û tîna roja azadiyê de, weke cemedê Xakelêweyê dihelin û di paşerojek geş û ronî de, bi semfoniya serhildana gaziyan dij bi bîdengî û kulpirjêna rengan fîj bi

bêrengiyê, niştimana pîroz a me di bindestî û zilma dagîrkeran de, rizgar dibe.

Îro gelê Kurd, li her çar parçeyên Kurdistanê Newroz kirine şahîyeke mezina gelêrî û roja azadî, rizgarî û berxwedanê. Gelê Kurd, dîsa Ceqna Newrozê li seranserê Kurdistanê û li hemû parzemînan Cîhanê herwekî naveroka wê ya dîrokî bi armanca rizgarî û azadiyê bi coşê mezin pîroz dîkin. Gelê Kurd, bi tîkoşîna xwe ya bê hempa, li serê çiyayan li gundan, li bajaran, li zîndanan, li her cih û warê jiyanê cejna Newrozê kirine çeperên tîkoşîna rizgarî û azadiyê.

Îro li seranserê Kurdistanê agirê Newrozê gurtir û geştir e. Li Başur û Rojavayê Kurdistanê bi rengê fermî tî pîroz kirin. Li Rojhilat û Bakurê Kurdistanê jî di gel hemû astengiyên dagîrkeran, bi wateya xwe ya dîrokî tî pîroz kirin û agirê rizgarî û azadiyê gurtir tî hilkirin û geşkirin. Newroz serbarê tev astengiyan ji aliyê dagîrkerên Kurdistanê we, li her çar parçeyên Kurdistanê bi coş ev cejn hate pîroz kirin. Bi taybet li Rojhilat û Bakurê Kurdistanê, ji bo dijmin û dagîrkeran peyamek bû.

Gelê Kurd di Newrozê de peyama berxwedanê ya dijî zordariyê da. Newroz dibe xala destpêkê ya ji bo

rizgarkirina ji hemû rejîmên zordar. Gelê Kurd ji dagîrkeran re got: Kurd wê Newrozê bikin çirûskek mîjûyî daku peyama aştiyê ji bo hemû gelan bide.

Herwiha ji dagîrkeran re jî got, ew ji bo bîdengkirina tevgera azadîxwaz, hemû hêza xwe bikarbinin jî, nikarin vî tevgerê bîdeng bikin.

Rejîmên dagîrker û yek ji wan rejîma totalîtar û zordar a bi nav Komara Îslamî a Îranê, astengî û şidetên tund li hember gelê mafxwaz û azadîxwaz yê Îranê çêkirin daku nekarbin agirê newrozê bi coş û bi girseyî hilbikin û dest avêtin tehdîdan û tirsandina xelkê Kurdistanê.

Lê, bi keyfxweşî we û herweke dihate çavniher kirin gelê me yê xebatkar û azadîxwaz yê Kurdistanê bîguh dan bi wan gef û îrîşên rejîmê û bi îrade û moralek bilind a şoreşvanî we agirê newrozê li ser bilindahiya çiya û di nava xwezayê û deşt û neval û kûçe û kolanên Kurdistanê teysandin û bi komcivînan mezin û şahî û dîlanê hewara azadîxwaziya xwe bilind û bilindtir kirin û ji dagîrkerên Kurdistanê û yek ji wan rejîma Îranê re gotin ku, tu hêz û zordariyek nikare tevger û tekoşîna me ji bo azadî û serbestiyê bisekinîne. Em hene û emê hebin û emê berxwe bidin. Serhildan jiyan e, berxwedan jiyan e.

Nê, Berxwedan û şoreş

N: Bêhzad Qadirî

Gundê Nê yek ji wan gundên herî mezin yê parêzgeha Sine ya li Rojhilatê Kurdistanê ye ku, li Pênç kîlometriya başûrê bajarê Merîwanê û gola Zirêbarê hilkeftiye. Ew gunda deriyê hatinûçûna tev gundên eniya Begzade û binara Surêne ye. Herwisa ji 900 malbatan pêk hatiye û nêzî 2900 kes nifosa wê ye.

Pîşe û karê xelkê wî gundî, bi sedema zevî û baxçeyên zêde, pîşe û karê pîrriya xelkê çandinî, cotyariye û beşeke din jî ku xwediyê erd û zeviyên nînin, mejûlî dukandariyê, kedkariyê û karên din in. Herwisa pêka wê ku nêzî sînûrên Kurdistanê hilkeftiye, hinek ji xelkê vir mejûlî karûbarên li ser sînoran in.

Pêka gotina xelkê wê navçeyê, navê “Nê” wisa xuyaye ku sê wateyên wê hebin: Yekem, Qamîş, duyem, Nê Aş ku, amûreke li Aş de ye û sêyem peyveke kevin û dîrokiye ku wateya gola xwînê dide.

Bi sedema hilkeftina stratîjîka wî gundî, û bi sedema pîrr av, hebûna deştek pan, dariştanên rixtim, bona xwe veşartî, karê heyvandariyê û ... hwd ji mîj ve avedan e. Herwisa Dêr û şonwarên dîrokî yên weke: Dêra Gulan, Wile Gewr, Qebira Begzade, Girê Xizîne, Asingeran, Esîhab, Gir û Zêyaret, Birakujav, Kepra hakim û ... hwd, mînakên selmandina jiyana dîr û dirêj a di wî gundî de ye.

Gundê Nê bi dirêjahiya dîrokê dehan carî hatiye şewtandin û xelkê vir pena bo cihên din ku li pişt gund hilkeftine birine, cikên weke: Gundê Kevin, Birakujav, Çavg û Eshab. herwisa heta niha jî, di cihên han de şonwarên jiyane her mane. Pêka belgeyên dîrokî, li nîveka deştilatdariya Qacarî de, xelkê Nê li gundê berê bo wî cihê hatine ku niha virin. Digel çend malbatên din di koçberiyê de, gundê Nê avedan kirine.

Wî gundî bi dirêjahiya dîrokê, gelek nexweşî û dijwarî dîtiye. “Reza Şa” bona birêvebirina biryara reforma dapoşîn(hicab)ê, deştîpêkê beraxwe dide wî gundî û herwiha bi sedema şer û pevçûnan jinek canê xwe jideşt dide û dehan malbat din jî dev ji gund ber didin û li başûrê Kurdistanê de dibin koçber.

Herwisa li deştîpêka şoreşa gelên Îranê de, çendîn caran êrîşî li ser gundê Nê hatiye kirin û topbaran kirin. Ji aliyekî din ve, li demsala Biha-ra sala 1367’an de jî, ji aliyê rejîma hilweşiyayî ya Be’îs a Îraqê, gundê Nê bi bombeyên kîmyayî hate bombebarankirin û bi sedan xelkê bê tawan şehîd û birîndar ketin.

Ew gunda li heyama xebata gelê Kurd de, rolek bandordar hebûye û li sala 1324’an de, çendîn kes digel Mihemmed Xanî Kanîsanî bi pêşwaziya Komara Kurdistanê li bajarê Mehabadê çûn. Herwisa li şoreşa gelê Îranê de jî, li dijî deştilatdariya Şa rabûn û piştî serhildana şoreşa Kurd, bi dehan ciwanên Kurd bûn bi pêşmergeyên Kurdistanê û çendîn kes ji wan canê xwe goriyê serweriya Kurdistanê kirin. Şehîd Kerîm Nîkpey, şehîd Rehîm Nîkpey, şehîd mela Husên Perwaze, şehîd Arîf Kesrayî, şehîd Kemal Xoşnewaz, şehîd Mensûr Ehmedî û şehîd Emîn Xawerî, mînakên şehîdên sorxelat yên Kurdistanê ne.

Herwisa şehîdên weke: Şehîd Hoşyar Kawe, Hadî Mînoyî, Ekrem Nişkaşî, Ferîd û Ekaşe Erijengî, Dilê Kîyanpûr, Emîn Remezani, Hamî Efşar, Bextiyar Xeyasî û Emîn Caşt, bi sedema teqîna mîn û deştûpeywendiyên rejîmê hatine şehîd kirin.

Gundê Nê li cihekî bûye ku, dehan mirovên zana û pênûs bideşt û navûdeng vir jidayîkbûne. Mamoşe Qan’î, helbestvanê hatî tepe-serkirî yê Kurdistanê ye ku bo heyameke zêde jiyana wî li gundê Nê derbaz bûye, û herwisa şêx Reşîd Husênî,

xelkê Dolaş û Neviyê mamoşe Qan’î, zêdeyî temenê xwe li vir derbas kiriye.

Feryedûn Dîrexşanî naskirî bi Koçer Bîrkar, bîkarekî hevçerxê Kurd e ku, li sala 1978’an, li gundê Nê jidayîk bûye. Navbirî hizrmendekî naskirî yê cihanê ye û niha li zanîngeha Kimbêrîc ya Bîrîtaniyayê de pîrofesore û li sala 2018’an de şîya mezintirîn xelata bîrkariyê ya cihanî ya “Nobel”ê deşt xwe bixîne. Koçer Bîrkar goritye: Hêvîdarim ew xelata kenê bixîne li ser lêvên 40 milyon kurdî.

Xelkê gundê Nê, her niha jî bo mînk xelkekî zindî ne û jî warê çand û kultûrî ve, Nê yekem gunde ku Encûmena kultûrî vir hatiye avakirin. Feryedûn Perwaze, Bextiyar Kawe û Nê’îmet Bereng, ji avakerên wê encûmenê ne. Herwisa dehan çalakvanên medenî, çandî û jîngehî li gund de, çalakin û ew gunda mînakên alîkarîkirin, bihev re jiyankirin, avmalî û herawezîyê ye.

Nê, xwediyê muzexaniyekê ye ku, sedan şonwarên kevin vir tîr ragirtin û rojane sedan kes serdana vir dikin. Herwisa xwediyê wê muzexaneyê li derheq ve muzexaneyê de dibêje: Li sala 1375’an de, bi baldan bi hizir û ramana xwe ku hogiriyeke zêde bi hunerê, bitaybet bi kalîgirafi(xoşniwîsî), resmandin û helbestan nivîsînê hebûye, û min îhsas bi girîngîdan bi muzexaneyê kir. Çend sal derbazbûn û ez kolan bi kolan û di bin kavişên hîloşawî de li pey amûrên berê û dîrokî ku nîşanderên nasnameya neteweya min be digiriyam.

Komek amûrên ku ji aliyê xelkênasiyê ve hebûn, li odeyeke li nav avahiya xwe de kom kirin û min ji xwe re digot, gelo dibe ku rojek bê xelkê bala xwe bidin bi wan amûran?

Ew muzexaneyê li hin beşên cuda pêk hatiye ku wiha ne: Xelknasî, cotyarî, kinc-

nasî, kilozên heriyê, Peyker, amûrên nêçîrê, corên xomre, kevîr û hewcehiyên berê yên jiyane. Nêzî 2500 parçeyên amûrên xelknasiyê yên taybet bi xelkê Kurdistanê di vê muzexaneyê de hatine komkirin ku, wisa xuyaye ewa yekem muzexaneyê gund be bi wan taybetmendiyan.

Herwisa xwediyê wê muzexaneyê gotiye: Ew muzexaneyê bi bê beramber û bi pêşwaziyek germ, amadeye bo serdana hogiriyan. Her şewazek ji amûrên kevin yên weke xelat ku, ji aliyê xelkê dilsoz ve dikare bibê alîkar, bona dewlemendkirina muzexaneyê.

Li dewra nû ya xebata vî carê de ku, bi Rasana Rojihatê navûdengê, dehan ciwanên weke keç û xortan bi pêşwaziya vî bangeşeyê çûn û her niha li enya xebatê de ne. Li deştîpêka serhiladana komara Îslamî heta niha, zêdetir ji sed ciwanên wî gundî bi sedema piştevanîkirina ji tevgera neteweyî û demokratîk hatine deşteserkirin û cezaya girtîgehê ji wan re hatiye birîn. Herwisa çendîn ciwanên gundê Nê, bi danîna barmteyê çavnehêrê cezaya girtîgehê ne. Di raştîyê de, ev deştkefta me’înewî û neteweyî ku niha li Nê heye, berhema xwîn û qurbanî û nîrx danê ye, û her çawan ku şehîd dr. Qasimlû fermayîş kiriye: “ Her neteweyek daxwaza azadiyê bike, dibe nîrx wê jî bide”.

Xelkê gundê Nê, xwediyê hesta neteweyî a bihêzin û her sal di hilkeftên neteweyî de yên weke, Newroz, Duyê Rêbendanê, 25’ê Gelawêjê û heta bo xem û şahiyên parçeyên din yên Kurdistanê, bi bê guhdan bi hêzên terorîst yên Spaha Pasdaran, rêûresmên xwe lidar dixînin. Newroza Nê, bi sedema ku bi şewazeke taybet tê lidarxistin, li seranserê Kurdistanê navûdeng e. Her bi vî sedemê komara Axûndî di heyama çend salan de binkeyeke mezin ya xwe di wî gundî de avakiriye.

Îran û krîz - Valahiya di navbera xelk û berprisan de

N: Namo

Biryardan û birêveberiya mezin li sîstema rejîma Îslamî a Îranê de, li destê kesên ku bi hêsanî dikarin wan weke mafyayên çensed kesî ragihînin ku, pileyên heştyar û sereke li destê wan de ne. li hikumeta Îslamî de ku mînaka herî xuya û berçav sîstemeke totalîtere ku, tak li lotkeya pîramîda deşthilatê de bi şewaza asoyî cih guherînê dikin û hemû hewla wan li pêxema berdewambûna deşthilat û paraştina hevsengiyê bona mana rejîma niha ye.

Tevî valahiya etnîkî, kultûrî, olî û çinayetî, valahiyên cor bi cor yên din jî, li bingehên sereke yên sîstemê de hebûna wan heye yên weke:

1- Valahiya îdolojîk û hizirî.

2- Valahiya baweriya dinavbera xelk û deşthilatdaran de.

3- Cudakirina xwediyan û yên xeynî xwediyan, ji aliyê deşthilat û piraktîzekirina slogana “her kes digel me nebe lidjî me ye”.

4- Kirîza kêrhatîbûn û rewabûna pêkhate û tevahiya sîstemê.

5- Valahiya civak, Dengûrengê rejîmê weke amûreke berhemanîne gotara îdolojîkî a şoreşa îslamî.

6- Valahiya lidijî berjewendiyên yektir dinavbera texên deşthilatran de.

Valahiya neteweyan

Siyaseta paktavkirin û helandina etnîkî û neteweyan li Îranê de, bi şewazeke sîstematîk û pilandarêtinî, lezgîniyeke zêdetr li nav xwe de dîtiye ku nîşana erênkirina dewlet û neteweya Îranê ye, ji aliyê etnîk û neteweyên din ve.

Di vê mînakê de, Kurdistan hemû deman bi şewaza nav-



endî kirîz û valahiya ewlehiyê bo deşthilata navendî bûye.

Valahiya olî û mesebiyan

Siyaseta wênesaziya kultûrî û olî bi tekezkirina li ser yekdeştîkirina meseb, pilandarêjî li pêxema zalkirina îdolojîya meseba hatî pejrandin ji aliyê deşthilatdar ve, li ser hogirî û baweriyên mesebên cuda.

Saziya piropagendeya Îslamî li Îranê de bi deştnîşandkirina bodceyeke bêsînûr ku her sal zêde dike û rejîma xwe bilindtr dike weke, saziya piropagendeya serdema hikumeta “Hîtlêr” bi hemû hêza xwe li hewldanan de ye ku, kultûra “Aşûra”yê ku li ser pêgeha radîkalîzma mesebiye cihgîr bike.

Valahiya Kultûrî

Pilandarêjiya deşthilatê li pêkanîna kultûra hatî pejrandin a ji aliyê deşthilatê ve ku dikare vê yekê kultûra “Aşûra”yê binav bike.

Berxwedana peravêzê li beramber dîtingeha zêdexwazî û reftarên dagîrkeraneya navendê li heyama sedsalên derbasbûyî de, bûye sedema rêkkestineke zêde dinavbera navend û peravêzê li Îranê de, bitaybet kultûra xelkê li herêma Zagrosê li ser pêgeha aşî, nîrxên mirovan û morala şadbûnê tevî rengan bûye. Guhertina kultûra bedeviya Kurdan digel kultûra reş û spî a Aşûrayê bo rejîmê ku av li dolê kutan e.

Encam

Rewşa niha ya civaka Îranê valahiyeke kûr û berbilav li tev warên birêveberî û siyasî, kultûrî, civakî û aborîyê de nîşan dide ku, deşthilat rakêşaye di nav kanala pirr xerab a siyasî û aborî de.

Rewşa niha ya civaka Îranê û berdewambûn û berbilavbûna nerizayetiyan tex û çinên cuda yên civakê, hikumet û dewleta wek Îranê digel kirîza rewaya tevahiya sîstema siyasî rûbirû kiriye û ev pîrsa li mejiyê xelkê de çê kiriye ku,

“Ev şeva reş dê çi demekî dawî pê bê?”.

Nerîna Lîderan



Aviv Kochavi:

“Em bo encamdana kiryarekê di Îranê de bi lezgînî xwe amade dikin.”



Nêçîrvan Barzanî:

“Hewce ye hikûmeta Îraqê qerebûya Kurdên Feylî bike.”



Jen Psaki:

“Îran sebebkarê raveştana gotûbêjên lihevkarina Ber-camê ye.”



Volodymyr Zelinsky:

“Hêzên Rûsiyayê li bajarê Buçayê de 300 kes ji xelkên sivîl kuştine.”

Almaniya bûdceya ragihandina pirzimanî ji bo saleke din dirêj kir!



N: Eskender Ceiferî

Di heyamên derbasbûyî de li Almanyayê ji bo careke din bûdceya toreke pirzimanî ya ragihandinê hate dirêjkirin.

Ew tora ragihandinî berî çend salan bi piştevaniya dewletê hate ragihandin ku tê de zimanê Kurdî jî, li kêleka zimanên hin neteweyên din cih digir e. Navê wê, tora ragihandinê ya pirrengî ye!

Vê torê di daxuyaniya xwe de ji xeynî zimanê Almanî, cih daye pênc zimanan ku Fransî, Erebi, Ingilîzî, Kurdî û Potrogalî li xwe digire. Beriya niha di daxuyaniya destpêkê ya karên vê torê de hatibû:

Em çalakvanên ragihandinê bi pêşîneya koçberî yan jî penaberiye ne û hertim heşt bi raştgirî yan jî nijadperestî û newekheviyê dikin. Li ser me gelek tê axaftin lê, belê ne bi me re. Em xelkê bi pirojeyên ragihandinî re li hev girê didin û dengê xwe hildidin û destêverdanê dikin.

Em bi perwerdekirin û lihevguhertina nerînan, hevdu xurt dikin. Emê bikarin ji bo her kesî toreke curbicur û pirreng biafirînin. Girîngiya vê torê ji bo Kurdan ev e ku zimanê Kurdî jî, li kêleka hin zimanan cih girtiye ku xwedî dewlet in û di asta navdewletî de jî tene bikaranîn.

Di beşeke din ji Em dixwazin bi heza ragihandinê, bêne guhdarîkirin û xwe têgihiştî bikin û meyl û heza kesên din jî, ji bo vî karî zêde bikin.

Em xwe ji bo tevlibûn bo guhertinên demdirêj û berfirehkirina ragihandinê, berpirsyar dibînin. Armanca me,

civakeke vekirî, pirreng û mayînde ye. Tora ragihandinê ya pirrengî, tora me ya nû ye ku ne tenê girêdayî çandekê ye.

Em ragihandinkarên ji welatên cuda, zimanên cuda û dirok û pêşîneyên cuda ne.

Ew dixwazin civakeke pirreng li vir pêk bînin. Lê, ji ber ku ev cara yekemîn e saziyek ku bi piştewaniya dewletê tê avakirin û li zimanê Kurdî jî xwedî derdikeve, Kurdên Almanyayê jî pêşwaziya wê dikin.

Vê torê di berdewamiya daxuyaniyê de ragihandiye ku em dixwazin jiyana xwe ya dilxwaz nîşan bidin. Em her tiştê ku bandorê dike li ser me, dikin raport û dîtî. Em nerînen nû derbasî nav ragihandina Almanî dikin. Em dixwazin ji bo pêkanîna gotûbêjan li ser mijara koçberî û penaberiye alîkar bin ji ber ku ev mijar, pêwendîdarî me ye jî. Di van bernameyan de ku em çê dikin, em li ser mijarên siyasî û civakî li Almanyayê bo cîgir û alternatîvên cuda diaxivin.

Gelek ji wan mijaran, derbarê me ne. Lê belê em xwe di penaberbûnê de yan jî tenê bi tiştên girêdayî civaka xwe sînordar nakin; Em helwestên xwe tînin zimanê, em dixwazin nîşan bidin ku em kî ne! Lewma jî serpêhatiyên cuda, bandorên çandî û herwisa nûçeyên derbarê rewşa niha jî, ji me re girîng in. Ew jî nîşan dide ku pirrengiya nîştimana her kesî û girêdanên wê, dikare pêwendîyan navbera dunyaya cuda ya her yek ji me pêk bîne û sînoran jî derbas bike.

Em dixwazin ew tiştên ku em bi xwe re tînin û hebûna me, wek xwe, bînin pejiwandin. Erê, rast e û Ewropî dizanin êdî Kurd bûne beşek ji rastiya Rojhilata Navîn.

Lewma jî ew Kurdan û zimanê wan, derbasî nav pirojeyên bi vî rengî dikin û

dibêjin pirrengiya pêşîneya me, me derbasî nav rewşekê dike ku bi nerîneke cihanî, lêkolînê li ser encamên niha, piroseya koçberî û penaberiye û herwisa stratejiyên siyasî û netewî bikin. Û bikarin karên perwerdehiyê bikin. Me bi ekterên saziyên penaberan û hinek saziyên din ên civakî re pêwendîyeke baş heye ku piştewaniya me dikin.

Em vê torê weke odeyek ji bo hemû mirovan jî binav dikin ku dixwazin ezmûna xwe li ser kiryarên newekhevî parve bikin bîyê ku raştî êrîşê bîyê yan jî li ser kesatiya xwe biaxivin.

Belkî wek çawan faşîstên Tirk dijatiya danîna zimanê Kurdî ji bo Facebook û Google jî kiribûn, dijatiya vê jî bikin.

Lê, van saziyan biryara xwe standine û di karên xwe de jî, ji bo zimanê Kurdî berdewam in. Ew dibêjin, bi pirrengiya mirovan û pirojeyên bi vî rengî, em xwe û hevdu bihêz û xurt dikin û rê didin ew mijarên me zêdetir li ber dest bin. Malpera me ya hevpar bi navê “Colourful Voices” vê derfetê çê dike ku wan naverokan ne tenê li bajarên xwe, lê belê li tevahiya Almanyayê û li derve jî belav bikin.

Lewma, em dixwazin derbasî nav ragihandina Almanî bibin û ji bo mayîndekirina wan mijaran li cem ragihandina Almanî alîkar bin.

Dawiya daxuyaniyê jî, wan behsa perwerdekirina rojnamegeran kiriye û dibêjin, di riya vê torê re, em dikarin pêwîstiyên teknîkî, madî û rêkxistinî pêk bînin ji bo ku bi pêkhatiyên cuda yê rojnamegeriyê hem hevdu perwerde bikin û hem jî bînin perwerdekirin. Bi vî awayî jî wê bi pirrengiya reftaran, karên me yê hevpar, hevbendiya me û lihevguhertina nerînan bi awayekî giştîgîr bihêz û xurt bibin.

Kurtiyek li ser wesiyetnameya serkomar Pêşewa Qazî bi “kurt û kurmançî”



N: Ebdûlazîz Qasim

Di destpêkê de û bi helkefta 75emîn, salroja bidarvekirina serokomarê Kurdistanê Pêşewa Qazî Mihemed, di 31`ê Adara 1947`an de, ku hevdem ev helkeft bi roja “Şehîd” li Rojhilatê Kurdistanê tê binavkirin, ku pêdivîye wekî erkeki netewî û exleqî, em şehîdê nemir Pêşewa Qazî û tevahiya şehîdên Komara Kurdistanê bi rêzdarî û hurmet bibîr bînin, û serê xwe ji wan re bitewînin.

Miletê kurd bi dirêjahiya dîroka xwe, ji bo azadiya xwe, qurbanîyên gelek mezin dane, helbet ku wê hêjî bide heta welatê xwe ji deşt dagîrkeran rizgar bike, û goman têde nîne ku di dîroka gelê kurd de, darvekirina serokkomarê Kurdistanê yek ji wan qurbanîyên herî tehl û trajîk e.

Di dîroka milletê kurd de, bi sedan rêberên kurd, bi taybetî di sedsaliya 19`an de, li ser deştê dagîrkeran bi awayên hovane dûr ji nîrxên mirovahiyê hatine kuştin û bidarvekirina, wekî bidarvekirina Şêx Ebdûlislam Barzanî, Ceco Xan, Şêx Se`îd, Xalidbeg Cibrî, Simkoyê Şikak, Seyîd Riza, Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Dr. Sadiq Şerefkendî, Şêx Maşûq Xeznewî û ... hwd, hevdem ku di dîrokê de belkî ti serokkomar ji bilî Pêşewa Qazî nehatine bidarvekirin.

Şer di navbera dewlet û miletan de, piştî bidawîhatina herdu şerên cîhanî yekem û duyem hatin rawestandin lê, li kurdiştanê şer nehatin rawestandin û gelek komkujiyên mezin li dijî milletê kurd hatin pêkanîn û kurdiştan bû



cihê bazarên reş di navbera dewletên dagîrker û dewletên zilhêz de, û heta vê gavê kurd bacên her şerekî herêmî yan cîhanî li kê deverê be didin, ku heta dûr nîne şerekî wekî yê Rûsyayê û Ukrayîne li ser hesabê milletê kurd bidawî bibe, ji ber ku kurdiştan bûye qada bazar û şerên navdewletî û herêmî.

Pêşewayê kurd, wisa di wesiyetnameya xwe de diyar dike ku, heta kurd nikaribin yekîtiya xwe ava bikin nikarin xwe rizgar bikin, zêdebarî ku gelê kurd netenê bi bêtî tifaqî û bi nebûna yekîtiyê nikarê xwe rizgar bike, hevdem ku ev yek ji bo gelê me bibe çavkaniya gelek karesat û nexweşiyên din, ji hemûyan mezintir û xerabtir bibe sedema peydabûna şerên navxweyî û birakujîyê.

Wesiyeta Pêşewa bo gelê kurd, berî 300 salan li ser zarê feylesof û helbestvanê kurd Xanî hatiye gotin, ku îro piştî 75 salan ji bidarvekirina serokkomar Pêşewa ku, saxkirina bîranîna roja şehîdan û wesiyetnameya Pêşewa girîngiyek herî mezin

bo dubarekirin û sêbarekirinê heye, herwisa bi xwendinek kûr û dirêj heye lê, bi kurt û kurmançî dikarim bêjim ku wesiyetname belgeyek dîrokî û girîng e, ku nivîsandina wesiyetê bi zimanê kurdî heta bê xwendina naveroka wê, girîngiyek taybet heye, hevdem ku naveroka wê gelekî binirx û watedar e, ku bi zelalî dide xuyakirin ku bi ti awayî nabe kurd baweriya xwe bi dagîrker û dijminan bînin, “heta heger bi Qûrana pîroz jî sûnd bixwin”, û ku herdem armanca dagîrkeran qirkirin û jinavbirina gelê kurd e û ji bo rizgariyê pêdiviya me bi î`lim û me`rifet û xwendinê û zêdebarî bi tifaq, rêkeftin û yekrêziyê heye û ji bilî xebat û canfîdayê me ti bijardeyek din nîne.

Yekîtiya kurdan, li rex Pêşewayê nemir, ne silogan û diruşim bû, û ne jî bo rêklam û bangêşekirinê bû, hevdem ku bi bîr û bawerî li ser erdê kar ji bo yekîtiya kurdan dikir û ti cudahiyek nedir di nava kurdan de, û di derbarê helwesta Pêşewa de, serok Masûd Barzanî di axafîneke xwe de amaje bi vê yekê

dike, ku Pêşewa Qazî li pêş dadgeha dagîrkeran red dike ku Barzanî bi kesekî biyanî binav bike û dibêje Barzanî li mala birayê xwe de bû û ew biyanî nîne, lewra her peyvek û her rîstek di wesiyetnameya Qazî wateyek girîng heye ji ber ku peyvên wê rastgu û reşteqîn in, û Pêşewa di jiyana xwe bi naveroka wesiyeta xwe kar kiriye û ji bo vê yekê ku wesiyetname beşek ji jîyan û baweriya Qazî bi xwe ne, tevî ku şehîdbûna Pêşewa qehremaniyek herwisa qurbanîyek herî mezin nîşan dide û heta hetayê, Pêşewa bû simbol û hêmayê azadî û canfîdayê ku, hêjayê nasnavê “Pêşewa” ye, û hêjayê gotinê ye ku Dr. Qasimlo û Şerefkandî her li ser heman rê û rêbazê şehîd bûn, her wekî gotina şehîd Dr.Ebdulrehman Qasimlo: “ku her miletek zindî divê zindî bimîne, divê xwe azad bikî, divê nîrxê azadiya xwe bide”, û qelen û nîrxê azadiya me yekrêzî û canfîdayî ye.

Hezar silav li riha Pêşewa û tevahiya şehîd û canfîdayên kurdiştanê bin.

Çi kesek zêhniyeta derûna me dixwîne



N: Vênûs Fayîq

W: Hesen Mukerem

Dubare tên li ser behsa jin an wisa bêjim ku zêhniyeta mîrsalarî, ev zêhniyeta wiha li bingeha hizirmendiya me de ye.

Çimkû kultûr bi nêrkirinê tenê li dabûrerît, paremayî û bi kêmtanîna jinê ye ku xwe li civakê de nabîne, her ev yasaya jî nîne ku li tev warên civakê de, mîr li ser jinê kiriye serdest û pileyek li pêş jinê daniye, belkû zêhniyeta mîrsalarî pareke li hizirkirinê û ev bawer û bîrdoziya herdu regezan bi hişyarî an nehişyariyê berhem tîne, û pênasayek giştîgîra civakê û îdo`ilojî û olî jixwe digire ku, wekheviya jin û mîr red dike û jinê li şewazeke din de pênasê dike, û cuda li pênasê ya mîr ku wekî ademîzad.



Ev şewaza hizirkirinê ku, li herdu zêhniyetan de diyar (Concious Mind) û nediyar (Unconcious Mind) e ku, hem jinê û hem jî mîr aştêk cuda heye, li demekê de ku karê ademîzadê hişyar ev ye ku wan herdu zêhniyetan ji yekitr cuda bike an wan cihgîr bike, çimkû her ev zêhniyeta diyare ku şiyana vê yekê heye lezgîntr guherînkari li ser de bê û dikarin vê zêhniyeta nexuya ya me biguherîne bi şewazekî ku tûşî rewşek li paradosê nebe, bi wateyeke din bi zêhniyeta (diyar) rahênanê bi zêhniyeta (nediyar) bikin ji bo vê ku, li hûndir de mirovek li axavtin û reftarên xwe de bo temaşeker û guhdar zeqtir bibe.

Çimkû dibe gelek kêmtan em mirovekî pêşkevîxwaz bin lê, di naverokê de paremayîtrîn mirov bin, eva

ye sadetirîn cudahiya dinavbera wan herdu zêhniyetan de.

Zêhniyeta nediyar berpirse, li mijarên çarenivîsaz û serçaveyên dahênan, heşt, azar, nîgeranî û rikeberiyên ku vir kom bûne, û xizîneya ezmûnên derbazbûyî û vebîranîn û perwedehiya me ye, û bi bê vê ku em bixwe bizanin li piraniya reftar û axavtinên xwe de nîşan didin, û bi hêsanî pênasê ya xwe dikin.

Weke vê ku pîzişkek genc li ser ekranên televîzyûnê gotibe:

“Kur neçin xwazbîniya keçikên ku nêrgeleyê dikêşin” her çend hêsan be jî ev Dêra lê, gotinek din li hûndirî wê de hatiye dîtin ku, gelek nîqaş li ser hatine encam dan çimkû, eva

zêhniyeta hûndire bo diaxive, li deqeyekê de kiriye bi mîrekî olî li mênbera mizgevtê de û fitweyan dide.

Li demekê de weke pîzişkekî pîspor karê wî li virda dawî dibe ku xelkê, li zirarên nêrgeleyê jî haydar dike.

Di vê demê de diviya ji keçikan re bêje jî ku: Ji mîrên ku nêrgeleyê dikêşin nezewcin, çimkû zaniştê ev yek alî kiriye ku, li ser aliyê sêksiya wan bandor heye û wan la-waz dike?

Mebeştê gotara min li ser wî pîzişkî bixwe nîne belkû, li ser zêhniyeta hûndirî me ye ku, heya me jê tune ye tê pêş û diaxive û me pênasê dike.

Helbet, merc nîne ku ev pîzişka ti mebeşteke wî hebe lê, axavtin bo kamerayan û hewldan bo gihandina peyameke tendrustiyê, hewcehî li hişyarî û agehdar bûn ji vê zêdetir heye bo vê ku, em li sînûrê xwe der nekevin û li hizira me be ku, îro li teknolojiyayê de zêhniyeta hûndirî me jî, nîşanî xelkê bide û birdebirdê çê bike.

Hevpeyvîna digel hunermend Kawe Urmiye beşa 1

P: Tu dikartî li ser vê berhema xwe ya nû hin zaniyariyan bidî xwenerên rojnamê?

B: Beriya her tiştî ez silavên xwe yê gerim pêşkêşî we û hemû berhevkarê rojnameya agirî dikim ku ew derfeta dane me ji bo vê reportajê em li ser berhema wê dawiyê ya li ser kesayetiya nemir şehîd “Dr.Qasimlo” me diyarî gelê xwe û hemû malbatên serbilind ên şehîdên Kurd û Kurdistanê kiriye

Her wekî hûn dizanin, di asîmanê welatê me de gelek stêrkên giranbiha diçiriskîn yekek ji wan stêrkên giranbiha ku hemêşe bo pêşengetiya neteweya xwe



şewq û tîraja xwe dide hemû mirovahiya pêşvero şehîd nemir Dr. Qasimlo ye. Daxwaza min ev e bi afirandina vê berhema pîroz û pir wate, nîfşên me yê nû zêdetir kesayeti şehîd nemir Dr. Qasimlo him baştir nas bikin û

him zêdetir li ser bixwînin û him jî bala wan li ser vê bê kêşandin li ser wê kesayetiya pîroz li ber vê yekê ku pêşeroja xwe ya gerim ya ronahî ku di vê kesayetiye de heye baştir bibînin û xwe bi poêş bixin. Gelek armancên min li ser vê

berhema pîroz hene ku yek ji wan ev e ku nivşên nû zêdetir Dr. Qasimlo li asta îlm û zaniştê wê de nas bikin bi wê wateyê ku ne bi siloganan wî nas bikin.

Belkî Dr. Qasimlo îro bi awayê fîzîkî li cem me nîne lê her dem û her gav bo gelê me bo netewa me bo pêşeroja me pêşengekî ku dikare ji bo her aştengiyekê çareseriyê bîafirîne ji ber vê yekê ku rêbaza şehîd Dr. Qasimlo rêbarek gelek pîroz e em ji hewceye bi wî awayî bi zaniştî ramana şehîd Dr. Qasimlo nêzikê vê kesayetiye bibin ku em bikarin di pêşerojê de em bo gel û netewa xwe bibin bi fayde û

»»»» doma R:9

xizmetek baştir û zêdetir bi awayek ku hewce be bi gelê xwe bikin û bi encamek baş bigihîjin.

Di berê de jî me gotiye û carek din jî dubare dikim ku şehîd Dr. Qasimlo bi tenê kesayetiyek Kurdiştanî nebû belku kesayetiyek li nav welatên cîhanê gelek

bas ji vî hatine kirin û bi awsayek bi şan û wec hatiye qebûlkirin di serdemê xwe

de bi karên xwe yên diplomasiyên pir wate li nav welatên cîhanî de pirek pîroz afirandiye anku di hêla danûstandin û guftûguyê de di hêla çareserkirinê de di hêla hezkirina di navbera gelan de ekolekî îlm û zanistê ye li nav netewa me de di seranserê Kurdiştanê de nirxek giranbeha ye û eger em bikarin ji wê nirxa giranbeha xwedî derkevin, hewce ye ku em rêbaza şehîd Dr. Qasimlo yê nemir, felsefeya wî, tekoşîna wî ya bê mînak em bi başî bizanin û wî bi başî fam bikin û seh û ruhê Dr. Qasimlo , neteweyî bû rihek Kurdiştanî bû, pêkanîna wesiyeta şehîd “Pêşewa Qazî Mihemed” û gelek ji şehîdên Kurd û Kurdiştanê, “Şêx Seîd” û “Seyîd Riza” bû, ji berî vê yekê, Dr. Qasimlo ji çar parçeyên Kurdiştanê de wekî sembola aşitî û azadî û danûstandin di navbera gelan de dihat qebûlkirin û bi çavekî tejî rêzdarî mêzeyî wî dikan, di her çar aliyê welatê Kurdiştanê de bigerî , dema tu behsa Dr. Qasimlo bikî bê guman ew kesayetiyê pîroz axî û keserek kûr dêxîne nav dilê gel xwe de bi wî awayî bas jê dikan û jê xwedê derdikevin û bi hesret basa kesayetiyê şehîd Dr. Qasimlo dikan;

Xendevanên me yên rojnameya agirî bi rastî hewce ye ku hêj zêdetir li ser vêp nirxa giranbiha ku kesayetiyê newiya Kurd e di asteke bilind de ra bigrin, nirxandina lêkolînan li ser vê nirxa giranbeha bi konferansan bi civînan bi nivşên nû bidin

nasandin ku kesayetiyê Dr. Qasimlo ev bûye.

Yanê bê guman bi reportajekê bi çend gotinan têra danasîna kesayetiyê Dr. Qasimlo nake û vê yekê him em dizanin û her kes jî wê dizane lê babetên serekî ev in û hewce ye ku em ji wê demê ve eger zarok bin bo zarokan dibistan û eger keç û xort û ciwanê me ne, Dr. Qasimlo wekî zanîngehekê ye, em bi wê awayî Dr. Qasimlo bidin nasandin û bikin bi îlm û zanist û ramana Şehîd Dr. Qasimlo em nêzikî felsefeya

şehîd Dr. Qasimlo bibin, ji vê demê ve hewce ye ku em hêj zêdetir Dr. Qasimlo di jiyana neweya rojaneya neteweya Kurd de bi taybet li Rojhilatê Kurdiştanê bê nasandin, bê lêkolînkirin , ew kesayetiyê pîroz, çimkî gelek maye ku em bibêjin em kesayetiyê bilind a şehîd Dr. Qasimlo nas bikin, bi wê sedemê ku ew kesayetiyê di her mijar û aliyekê de him rewşên awarte û him rewşên aşitîxwazane jî şehîd Dr. Qasimlo , her dem û her gawê bo hizra giştî ya cîhanê û welatê xwe selabet û mezinatiya xwe nîşan daye, ev cihê serbilindî û serferaziye ye.

Bi kurtî ez dikarin li ser wê kesayetiyê bilind vê yekê bibêjim, ku ev hêvîdarim ku sehên min ên hunermendîtiyê bi başî hatibine fêmkirin ku ez çî dibêjim û xwendevanên me yên rojnameya Agirî jî bi başî armanca min ji wê vê danasîna ku min bi selabet xwe yên netewî min pêşkêşî gelê xwe kirine bi başî mêze bikin û em bi hev re bigihîjin bi encamekê çimkî, ez vê yekê dubare dikim ku kesayetiyê Dr. Qasimlo û felsefeya wî mijarek gelek giranbiha ye, nirxekî herî giranbiha ya netewa Kurdiştanê ye, hewce ye em di asteke herî bilind de, wekî dersên rojane li nav jiyana xwe ya şoreşgeriya xwe û tekoşîna xwe ya bo azadiya Kurd û Kurdiştanê de, xwedî derkevin ji destkevtin ji gelê Kurdiştanê û babetên giranbeha divê lê xwedî derbikêvin û her wî awayî li tev warên jiyana de em şehîd Dr. Qa-

simlo danasîna wî bi awayekî kê tê xwestin di warê zanistî de danûstandinê bi nivşên nû re em danûstandinê li ser bikin û bigihîjin bi encamên baş.

Bi wan sehan ez carek din silavê li hemû xwendevanên rojnameya Agirî dikim, keyfxweşim ku ew derfeta her çî qas belkî em bi derng man wekî lêbihorînekê ji we xebatkarên rojnameya Agirî bixazim ku bi sedema çalakî û xebata kar a rojane li rozên pîrozbahiya Newrozê min nekarî bersivê ve bidim û ez daxwaza ji min bihorînekê li we dixwazim keyfxweşim ku ev

derfeta we da me ku me karî hinek li ser wê kesayeta pîroz bersiva pirsyarên we bidim.

Carek din ez bi hurmetek mezin şehîd Dr. Qasimlo bi bîr tînim û keyfxweşim û şanaz im ku min karî eger her xizmetek biçûk be jî bo danasîn, bo rêzgirtin û vebîranina nemir şehîd Dr. Qasimlo bi xebatek hevpar pêşkêşî gel xwe û wê kesayetiyê giranbiha bikim.

P: Çawa bû ku tu bîr ji berhemek wiha bikî?

B: Ew berheme heyamek dirêj bû ku wekî barekî li ser milê min bû ku ezê çawa bikarim çalakî û xizmetek hunerî bo bîranîna û rêzgirtina kesayetiyê nemir Dr. Qasimlo bikim;

Bi rastî gelek keyfxweş û şanaz im ku min kariye bi xebetekî hunerî, şehîd Dr. Qasimlo bo ji nivşên me yên nû wekî destanekê, nikarim bibêjim şîran, destana pênasekirin û danasîna şehîd Dr. Qasimlo ji bo nifşên me yên nû ji bo netewa me bi çalakiyek hunerî rabigihînim,

keyfxweş û şanaz im di wê xebata hunerî de, xebatek hevbeşane li gel mamoste “Gernas Koçer” li gel mamoste “Seyîda Perîçek bi helbesta mamoste “Gernas bi awayê Seyîda Perîçek û berhevkirina min di nava hewldanan û bi alîkariya gelek rêhevalên din, mozîkjenan min karî ew xizmeta pîroz şîkur dikarim bibêjim bi cih anî, gelek keyfxweş û şanaz im, ji ber ku di ciwaniya min de min dest bi karê hunerî kir pêşengên doza şehîd Dr. Qasimlo her dem û her gaw ji min re bûn alîkar di warê hunerê de teşwîq dikirim moral û keyfxweşiyek mezin dida min ew kefxweşî û hêza wan hêza min ya hunerî bihêztir dikir ku bê guman ewê jî dîrokek xwe dîr û dirêj heye dibe ku di demê pêşiya me de li ser wan babetên giranbiha jî em dikarin hinek zêde rawestînin, ema ez keyfxweşim ku bi rastî ew berhema pîroz ji bo bîranîna û rêzgirtina nemir şehîd Dr. Qasimlo me bi hewldan û xebatekî hevbeşane û pîroz

pêk anî, diyarî kesayetiyê nemir Dr. Qasimlo û hemû malbatên şehîdan û netewa xwe netewa Kurdiştanê dikim, hêvîdarim ku me karî be xebatek eger ji deryaya îlm û zanista nemir Dr. Qasimlo wekî dilopekê jî be me kariye wê xizmetê diyarî gelê xwe bikin û em keyfxweş û şanaz in ku bi rastî piştî belavkirina wê berheme gelek peyamên pîroz ji her çar parçeyên Kurdiştanê ve ji diyasporayê ve li hundirê welat ji derveyî welat me peyem gelek pîroz girtin, yek bi yek xwediyên wan peyaman sazî û demûdezgahên Kurdiştanê, xwendevana, hêz û hereketên Kurdiştanê, ez jî rêz û silavê xwe hemûyan re dişînim , yek bi yek eger rojnameya agirî bi xwe biwînin dê her kes bizane ku em rêz û spaiya qedirşinasiya ji wan re dişînim û baş bizanin ku em gel kî ne, keyfxweş û şanaz im ku me karî vê berhema pîroz diyarî gelê xwe bikim

Beşa 2 a hevpeyvîna digel Kawe Urmiye dê li hejmarê bê ya rojnameyê de bê parvekirin.

Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistanê de

Binçavkirina du keç û sê kurên Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve

Roja Yekşemî 14`ê Xakelêweyê, 5 welatîyên Kurd ên bi navên “Perîsa Spahî” temen 17 salî û xelka bajarê Mihabadê, “Kewyar Elyasî” temen 18 salî û xelka bajarê Mihabadê, “Êrfan Zulfîniya” temen 18 salî û xelkê bajarê Seqizê, “Yûsif Heşretî” temen 22 salî û xelkê bajarê Pîranşehrê û “Mensûr Kanîreş” temen 32 salî û xelkê bajarê Pîranşarê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyên yasayî ew 5 welatîyên Kurd li nêzîk gundê “Karxaneqend” a bajarê Pîranşehrê binçavkirin û piştî bo lêpîrsînê bo girtîgeha ewlehî ya îdareya Îtîla`ata bajarê Pîranşehrê veguhaştin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmetên ku li ser wan 5 welatîyan hatiye sepandinê ti zanyariyek serast berdest nîne.

Şewra û dêhyarê gundê Tengîserê bo Îtîla`ata Spahê hatine gazîkirin

Roja Pêncşemî 11`ê Xakelêweyê, Îtîla`ata Spahê şewre û dêhyarê gundê “Tengîser”ê bo wê navenda ewlehî gazî kirin. Çavkaniyeke aqêdar li derheq sedema gazîkirina şewra û dêhyarê gundê “Tengîser” ragihand: Biryar bû roja Şemî 13`ê Xakelêweyê, li wî gundê rêûresma sêzdehikê bihatiba lidarxistin, lê Îtîla`ata Spahê bi şewra û dêhyarên “Tengîser”ê re ragihandiye ku nabe ew rêûresme bê lidarxistin.

Herwisa wê çavkaniyê basa vê jî kir, ku Îtîla`ata Spahê gef li şewra û dêhyarê gundê xwariye û gotiye; Li hegera lidarxistina rêûresma sêzdehikê, hûn berpîrsiyar dibin.

Digel destpêka cejna Newrozê, navendên ewlehî û Îtîla`atê hejmarek zêde ji welatîyên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê gazî kiribûn. mala “Celal Vefayî” û piştî vekolîna mala wî, navbirî binçav kirin.

Rojhilatê Kurdistanê/ li sala 1400`an 44 kesên medenî bûne qurbaniya mînê

Bi hilkefta roja 4`ê Nîsanê roja cîhanî ya “huşdarî û lihemberderkevtin li dijî mînan” amara qurbaniya xelkê medenî bi sedema teqîna mînên şer li Rojhilatê Kurdistanê hatiye belavkirin.

Ev amare ji aliyê Navenda Amarî ya Rikxirawa Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê ve hatiye belavkirin û nîşan dide ku li sala 1400`an a Rojî, li Rojhilatê Kurdistanê çend kes bûne qurbaniya mînên bicihmayî ên şer.

“Kurdpa”yê belav kiriye ku 44 kesên medenî li bajarên Rojhilatê Kurdistanê bi sedema teqîna mînê bûne qurbanî û ji wan “9 kes mirine û 35 kes hatine birîndarkirin”.

Amar wiha ye:

4 kes ji wan qurbaniyan jin bûne.

7 kes ji wan kesên qurbanî zarokên di bin temenê 18 saliyê de bûne. 1 ji wan hatiye kuştin û 6 kes jî birîndar bûne; kêmtirîn temenê wan 5 salî bûye û zêdetirîn temen jî 15 salî bûye.

12 kes zozançî, 10 kolber, 9 şivan, kedkarek û cotiyarek jî bûne qurbaniya teqîna mînê.

Ev kesên bûnî bi qurbaniya teqîna mînê ji wan parêzgehên Kurdistanê ne.

15 kes ji parêzgeha Îlamê û nemaze ji bajarên Mêhran û Dêhloranê, 12 kes ji parêzgeha Kêrmaşanê û bi taybet ji bajarên Qesrî Şêrîn û sînore Newsûdê, 11 kes ji parêzgeha Sineyê bi taybet sînore Bane, 5 kes ji parêzgeha Urmiyê bi taybet ji bajarê Serdeşt û kesek jî, ji Ecemşêrê.

Herwisa 3 kes ji fermanberên hilgirtina mînan li navçeya Şerhana Dêhloranê bi sedema teqîna mînê mirine û birîndar bûne, ji wan 2 birîndar û yek kuştî.

2 kes ji hêzên leşkerî li ser xalên sînorî yên Bane û Newsûdê bi sedema teqîna mînê hatine birîndarkirin.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (419)

